

Fêr -5

CÎNAVKÊN KESANÎ / ŞAHİS ZAMİRLERİ

Ji peyvên `ez`, `tu`, `ew`, `em`, `hûn`, `ew` re cînavkên kesanî tê gotin. Bi tirkî beramberiya van cînavkan wiha ye:

Kesên kit/ tekil şahıslar

Ez ben



Tu sen



Ew o



Wê o (dişil varlıklar için geçmiş zaman)

Kesên kom/ Çoğul şahıslar

Em biz



Hûn siz



Ew onlar



Di zimanî kurdî de, ji bo dema borî ya diyar taybetmendiyêke divê were zanîn heye:

Lêkerên di zimanê kurdî de du cure ne. Cureyek ``ên bireserê digrin``, cureyek ``ên bireserê nagrin``. Lêkerên ``bireserê digrin`` di dema borî de cînavkên xwe diguherînin. Wê demê rewşêke wiha derdikeve holê:

Ez	Min	olarak deşîşir
Tu	Te	olarak deşîşir
Ew	Wî (eril), Wê (dişil)	olarak deşîşir
Em	Me	olarak deşîşir
Hûn	We	olarak deşîşir
Ew	Wan	olarak deşîşir

Ji bo kesa sêyem û kesê sêyem ê kit di zimanê kurdî de li gorî girtina bireserê (nesne) ji bo dema borî cînavkên cuda tên bikaranîn:

Dewran nan xwar.	Wî nan xwar. (eril)
Xezalê bavê xwe dît.	Wê bavê xwe dît. (dişil)
Dewran çû sûkê.	Ew çû sûkê. (eril)
Xezalê ji malê hat	Ew ji malê hat. (dişil)

Tê dîtin ku bi lêkerên bireserê nagrin re ti guhertina zayendî çênabe, guhertina zayendî bi lêkerên bireserê digrin re çêdibe. Ji bo mirov zanibe bê lêkerêk bireserê digre yan nagre mirov ji kirdeyê pirsra `Çi?/Ne?` dipirse, ger bersivê bide, ew lêker bireserê digre.

Min xwar. Te çi xwar? Min nan xwar. Peyva `nan` bireser e.

Ez ketim. Te/Tu çi ketî? Ji ber ku pirsek bê wate ye, lêkera `Ketin` bireserê nagre.

Bi cînavkan sazkirina hevokên navdêrî:

Ez xwendekar im. Tu karker î. Ew cotkar e.

Em xwendekar in. Hûn karker in. Ew cotkar in.

Di zimanê kurdî de, lêkera `bûn/bûyîn` a li pey navan tê, ji navdêrê cuda tê nivîsandin. Di çêkirina hevokan de guhertina lêkera `bûn` a li gorî kesan divê were zanîn:

Ezim.

Ben.....im

Tu.....î.

Sen.....sin

Ew.....e.

O.....dir

Em.....in.

Biz.....(ler) iz

Hûn.....in.

Siz(ler) siniz

Ew.....in.

Onlar(ler) dir

Mirov dema xwe dide nasîn dikare wiha bêje:

Ez Dewran Ehmed im.

Ben Dewran Ehmed'im.



Ez Leyla Dildar im.
Ben Leyla Dıldar'ım.



Tu Mehmûd Osman î.
Sen Mehmud Osman'sın.



Ew Selîm Sîlwan e.
O Selim Sîlwan'dır.



Ew Sêvê Narîn e.
O Seve Narin'dir.



Ew zarokeke keç e.
O bir kız çocuktur.



Em Zinarîn û Zinar in.
Biz Zınarin ve Zinar'ız.



Hûn birêz Dewran û Stiya Zinê ne.
Siz bay Devran ve bayan Zine'siniz.



Ew saet in.
Onlar saatlerdir.



Di zimanê kurdî de, dema mirov hevokên wiha saz dike, lêkera `bûn` li gorî tîpa dawîya navdêrê jî tê guhertin. Ger navdêr bi tîpeke dengdêr bi dawî bibe cuda tê nivîsandin, ger navdêr bi tîpeke dengdar bi dawî bibe wekî li jêrê tê nivîsandin:

Ez xwendekar im.

Ez mamoste me.

Ben öğrenciyim.

Ben öğretmenim.

Navdêra `xwendekar` bi tîpeke dengdar bi dawî bûye û ji bo vê `-im` hatiye dawiyê, lê navdêra `mamoste` bi tîpeke dengdêr (a,e,ê,i,î,o,u,û) bi dawî bûye û ji ber vê lêkera `bûn` jî awayê `-im` xwe veguheztiye `-me`. Ji bo hemû cînavkan em, vê veguheztinê bibînin:

Ez.....im/me.
Tu.....î/yî.
Ew.....e/ye.
Em.....in/ne.
Hûn in/ne.
Ew.....in/ne.

Ez keça Siltanê me.
Tu kurê Xecê yî.
Ew xwişka Misto ye.
Em zarokên Medî ne.
Hûn ji Amedê ne.
Ew ji Swîsrê ne.

Ben Siltan'ın kızuyım.
Sen Ghece'nin oğlusun.
O Mısto'nun kızkardeşidir.
Biz Med çocuklarıyız.
Siz Amed'lisiniz
Onlar İsviçrelidirler.

Em çend mînakan bidin/birkaç örnek

Em li vir in.
Biz burdayız.



Ew li wir in.
Onlar ordadırlar.



Tu mamosteyek î.
Sen bir öğretmensin.



Ez xwendekarek im.
Ben bir öğrenciyim.



Tu şagirtêk î.
Sen bir garsonsun.



Ew bijîjkek e.
O bir doktordur.



Ew hemşîreyek e.
O bir hemşiredir.



Em ajokar in.
Biz şoförleriz.



Hûn şagirt in.
Siz garsonlarsınız.



Ew leşker in.
Onlar askerlerdir.



Ma ew leşkerek e?
O bir asker midir?
Belê, ew leşkerek e.
Evet, o bir askerdir.



Ji bo çêkirina hevoka pirsyarî, mirov peyva `Ma`
bîne serê hevokê bes e.

Ma Silo xwendekarek e?
Silo bir öğrenci midir?
Belê, ew xwendekarek e.
Evet, o bir öğrencidir.
Belê, Silo xwendekarek e.
Evet, Silo bir öğrencidir.



Ma ew mamosteyeke jin e?
O bir kadın öğretmen midir?
Erê, ew mamosteyeke jin e.
Evet, o bir kadın öğretmendir.



Ma Hêlinê hemşîreyek e?
Helin bir hemşîre midir?
Erê, ew hemşîreyek e.
Evet, o bir hemşîredir.




Ma ev şûşeyek e?
Bu bir şişe midir?
Erê, ev şûşeyek e.
Evet bu bir şişedir.



Ma ev şûşe ne?
Bunlar şişeler midir?
Belê, ev şûşe ne.
Evet, bunlar şişelerdir.



Ma ew bijîjk in?
Onlar doktorlar mıdır?
Na, ew ne bijîjk in.
Hayır, onlar doktorlar değıldir.



Ma ev pirtûk in?
Bunlar kitaplar mıdır?
Na, ev ne pirtûk in.
Hayır, bunlar kitaplar değıldir.



Ma ez bijjkek im?
Ben bir doktor muyum?
Belê, hûn bijjkek in.
Evet, siz bir doktorsunuz.



Ma ez mamosteyek im?
Ben bir öğretmen miyim?
Na, hûn ne mamosteyek in.
Hayır, siz bir öğretmen değilsiniz.



Ma ew bijjkekî diranan e?
O bir diş doktoru mudur?
Belê ew bijjkekî diranan e.
Evet, o bir diş doktorudur.



Ma jin xweşik e?
Kadın güzel midir?
Erê jin xweşik e.
Evet kadın güzeldir.



Wekî navdêran, dema mirov hevokên rengdêrî jî
saz dike, dîsa lêkera bûn ji peyva rengdêrê cudatir tê
nivîsandin.

Peyvên wekî `sor, mezin, piçûk, dirêj, pîr, kal`, tev
`rengdêr` bûn. Dema mirov dibêje: `Ez mezin im`. `Tu pîr
î`. `Ew kal e`. `Em ciwan in`. `Hûn birçî ne`. `Ew têr in`...
lêkera `bûn` a xwe wekî `im, î, e, in`, veguheztiye ji
peyvên rengdêrî cudatir tê nivîsandin.

Ma tu pîr î?
Yaşlı mısın?
Na, ez ne pîr im.
Hayır ben yaşlı değilim.
Ez ciwan im.
Ben gencim.



Xwendekar ciwan e.	Öğrenci gençtir.
Ma xwendekar ciwan e?	Öğrenci genç midir?
Erê, xwendekar ciwan e.	Evet, öğrenci gençtir.
Na, xwendekar ne ciwan e.	Hayır, öğrenci genç değildir.
Xwendekar ciwan in.	Öğrenciler gençtirler.
Ma xwendekar ciwan in?	Öğrenciler genç midirler?
Erê, ew ciwan in.	Evet, onlar gençtirler.
Na, ew ne ciwan in.	Hayır, onlar genç değildirler.

FÊRBÛN/ALİŞTIRMA

A- Lêkera `bûn` a li gorî kesan tê guhertin; (im/me, î/yî,
e/ye, in/ne) di cihên vala yên di van hevokan de bi cih
bikin:

- 1-Ew jinek xweşik.....
- 2-Em xwendekar
- 3-Ew ne leşker(kit)
- 4-Ew bijîkkek

- 5-Ez mamoste.....
 6-Ew pîr.....
 7-Ew ne polis.....(kom)
 8-Ma ez xwendekarek.....?
 9-Hûn ne mamoste.....
 10-Tu ne Silêmanê Oso.....

B- Cînavkên kesanî bixin şûna navan:

Mînak: **Zilam** ciwan e. **Ew** ciwan e.

- 1-Jin xweşik e.
 2-Dewran kal e.
 3-Zîné jîr e.
 4-Dewran av vexwar.
 5-Zîné em dîtîn.
 6- Bavê te solek kirî.
 7-Xaltîka te hat.
 8-Xwişkîka te name nivîsand.
 9-Psîk çû ser darê.
 10- Psîkê mişkek girt.

C- Van hevokan destpêkê bikin ên neyênî, pişt re veguhêzin ên pirsyarî:

Mînak: Em karker in. Em ne karker in. Ma em karker in?

- 1-Em xwendekar in.
 2-Hûn mamoste ne.
 3-Ew keçek e.
 4-Dewran ciwan e.
 5-Psîk girs e.

- 6-Em bijîjk in.
- 7-Ew hemşîre ne.
- 8-Ez mêvan im.
- 9-Tu mazûvan î.
- 10-Bijîjk kal e.

D- Destpêkê bersivên erênî, pişt re bersivên neyênî bidin van pirsan:

Mînak: Ma ez mamoste me? Erê, tu mamoste yî. Na, tu ne mamoste yî.

- 1-Ma tu karker î?
- 2-Ma hûn bijîjk in?
- 3-Ma ez xwendekar im?
- 4-Ma em birçî ne?
- 5-Ma hûn têt in?
- 6-Ma ew dibistanek e?
- 7-Ma ew kevçî ne?
- 8-Ma ez dirêj im?
- 9-Ma tu kin î?
- 10-Ma ew pîr in?